

Huner û mûzîka
Kurdî li Rojhilat û
riftara dewletê

»»» R:7



Bo kuştina
me, ne hewceyî
yasayê ne

»»» R:3



*Bideştveanîna mafên netewî yên gelê kurd
di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de*

Agirî

Duheftînameyek Siyasetî-Giştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî
www.agirimedia.org Hejmar (377) 06-07-2020 Buha (1000) Tûmen

Hawara azadîxwaziya
Rojhilatê Kurdistanê bi tepe-
seriyê nahête fetisandin

»»» R:4



Reaksyonên neyaran
li dijî lihevkirina Kurdî-
Kurdî

»»» R:8



Hizra me ya kesk rêber e

Tevî vê ku dagîrk-
er bi salan e di
hewlê de ne, da ku
axa nîştimana Kurdan
dagîr bikin û bi agir-
berdana daristanan,
xwezaya ciwan lê zevt
bikin, û bi hezaran
hewlên kirêt, samana
wê nîştimanê talan
bikin, lê hin kes hebûn
û hene ku di hemberî
van hemû zêdexawzî
û namirovbûnê de
sekinîne, û di wê pêx-
emê de jî canê xwe li
rêya her bihûstek ji axa
wî welatî de gorî kirine,
û xemsarî nekirine.

Dîroka wê nîştimana
birîndar pir e ji tira-
jêdiyayan ku belkî
kêm neteweyên din
hebin, ku ew trajîdî
dîtibin, yan jê fam
bikin. Bi awayekî ku
gelek caran tê gotin
ku çarenivîsa me her
şehîddan e, şehîdê
nan, şehîdê azadî,
şehîdê rizgarî, şehîdê
jîngehê û ...hwd, çar-
enivîsa Kurd wisa lê
kiriye, ku di pêxema
gişt ciwanîyên jiyan
û mirovayetiye de
herwisa şehîd bibe, û
şehîd bide. Dibe em
bimrin heta ku jiyan
şîn bibe, û kirêtkirin
û şewitandin, rûyê erdê
û mirovayetiye ji wê
hindê reştir neke.

Tevî hemû dagîrkarî
û talankirina ku bi ser
ceştuya wê nîştimanê

de hatiye, dîsan jî
xortên emegdar ên wê,
canê binirx ê xwe di
pêxemê de didanên.


Di roja 3-ê Xermanan
a sala 1397-an de,
Şerîf Bacwer û Omîd
Konepoş ji çalakvanên
Jîngehparêz, di dema
temirandina agirê
dariştanên Merîwanê
de şehîd bûn.

Xelkê emegdar ên
Kurdistanê ku hertim
li pêxema paraştina
axa Kurdistanê de, bi
silogana “Hizra me ya
kesk rêber e”, ji bilî
ragihandina emegna-
siya xwe bo şehîdên
jîngehê, peyman digel
şehîdan û darberûyên
Kurdistanê nû kirin
ku heta dawiya ji-
yana xwe wekî Şerîf
û Omîd di wê pêxemê
de hewl bidin, û nehê-
lin dareke dariştanên
Kurdistanê di nav
agirê neyaran de
bişewite, û hêvî bimre,
û şerefa nîştiman leke-
dar be.

Piştî hemaseya bi-
axêspartina şehîdên
jîngehê, û birêkirina
wan bi sirûda “Ey
Şehîdan” bo warê wan
ê heta-hetayî, zêdetir
ji caran xelkê pêngav
avêtine wê meydanê,
û eva ku ji deştê wan
hatibe kêmasî nekirin.
Şehîd Şerîf Bacwer
û Omîd Konepoş bi

gorîkirina canê xwe bo
wê nîştimana birîndar,
riha yegirtinê di nav
xelkê de zindî kirin, û
ragihandin ku jiyan
darberûyên Zagrosê ev
hinde binirx in ku dibe
amade bî jiyan xwe
bo wan darberûyan
gorî bikî.

Di heyama du salên
derbasbûyî de, bi
berdewamî dariştan û
çêringehên Kurdistanê
ji aliyê neyarên jînge-
hê û deştwerdanên
Komara mirovkuj



a Îslamî a Îranê
ve hatiye têkdan û
şewitandin, û jîngejha
Kurdistanê ziyanke
gelek zêde ditiye, eva
di halekê de ye ku
jîngehparêzên Kurd-
istanê hemû hewla
xwe bo kontirolkirina
agirê dariştanan daye,

û eva ku karîbin bo
rizgarkirina dariştanan
û vegerandina henase
bo jîngeha Zagrosê
kire.

Hewla nemirovane
a deştihildarên Ko-
mara Îslamî tirajêdiya
şehîdbûna jîngeharê-
zan dûbare kir, û
mixabin roja yeksemî,
8-ê Pûşperê, 4 kes ji
endamên Encumena
“Jîwa” ya Pawe ku du
kes ji wan endamên
PDKÎ bûn, di dema
temirandina agirê

dariştanên “Bûzîn û
Merexêl” a Paweyê de
canê xwe di pêxema
paraştina darberûyên
Kurdistanê de pêşkêşî
nîştimana xwe kirin.
Hatina ser şeqaman
a xelkê Pawe bo
pêşwazî ji termê
şehîdên nû ên rêya

rizgariya Zagrosê ji
agirê dujminên wê, di
vê rewşê de ku Korona
mezintirîn gef e bo ser
jiyana mirovayetiye,
nîşana wê birîna kûr e
ku niha di dil û hinavê
tak bi takên xelkê
Kurdistanê de reh û
rîşe dakutaye.

Komara Îslamî ya
Îranê di heyama wan
salên derbasbûyî
de hewl daye ku bi
berdewambûn li ser
berdana agir li laşê
wê nîştimanê, merg û
nemanê li cem xelkê
me asayî bike, û beje
me ku hûn mehkûm
in bi nemanê, bêy vê
ku agehdar be ku wekî
pîredar a çîroka “Celal
Melekşa” em namirin,
û ji wê serê mirinê ve
jî be, emê her bèn!

Şerîf Bacwer, Omîd
Konepoşî, Muxtar
Xendan, Bilal Emînî
û Yasîn Kerîmî, çûne
nav refên şehîdên
Kurdistanê, û çî ji wê
mezintir û sertir ku di
pêxema ax û nîştiman
de canê xwe bikî gorî.
Jîngehparêzan bi
şehîdbûna xwe li
pêxema paraştina
dariştanên Kurdistanê
de kevireke din
ya bingehdanîna
nîştimana xwe danîn,
û bi xatircemî ve nifşa
siberojê jî, hizra wan
ya kesk dibe rêber.

Sergotar

Rêya Urşelîmê



N: Kerîm Perwîzî

Wek tê gotin ku navka rejîma “Wilayeta Feqîh” digel dijayetiya hikûmet û netewa Îsraîlê hatiye birîn. Dema ku Xomêynî di Tehran de deştilat kete deştê wî de, û hemû hevkarên xwe vêde birin, bo wê ku ji çepên tundajo paş nekeve, deşt avête gefxwarina li dijî Îsraîlê, û heta roja Înê ya dawîya Remezanê, bi navê roja “Quds” diyarî kir, da ku tev Misilmanên cîhanê li dijî Îsraîlê han bide.

Deshelata Xomêynî di hindek tiştan de, bi awayekî tewaw îdolojiya Marksîst-Lênînîstî û hêla Tûde di Îranê de peyrewî dikir û siyaseten xwe bi awayekî dadirêşt ku li piropagendên hêla Tûde paş nekeve. Bo mînak bo vê ku îsbat bike ku zêdetir ji Komonîstan li dijî Amerîkayê ye, êrîş kire ser balyozxaneya Amerîkayê di Tehranê de û karmendên wê bi barimte girtin. Cihekî din ku Xomêynî û hevdeştên wî dixwastin ji Tûde û Tûdeyan paş nekevin, dijayetîkirin digel Îsraîlê bû, û wan ew dijayetiya kevneşopiya hindek ji mezhebiyên xwe, li dijî Ci-hûyan, tevî îdolojiya siyasî a xwe kiribûn, û eva çar dehik in, ku hawar dikin wê Îsraîlê biherifînin û ji nav bibin.


Di serdema şerê malwêranker a Îran û Îraqê li dehka 60`î a Rojî de, heta Xomêynî bi vî awayî ciwanên peyrewên rejîma xwe han dida, ku hekî dixwazin Qudsê Rizgar bikin, dibe li deştê pêkê rejîma Sedam biherifînin, û silogana naskirî a wan eva bû ku “Rêya Qudsê ji nav Kerbelayê re derbas dibe”. Mebesta

wan eva bû ku dibe di pêş de, Îraqê dagîr bikin û Kerbelayê bigrin û di vir jî ber bi rizgariya Qudsê ve herin. Yanî armanca wan a sereke gihîştin bi Qudsê û jinavbirina Îsraîlê bû, û şer digel Sedam û dagîrkirina Kerbelayê tenê deştê pêka kar bû!

Silogana rêya rizgariya Qudsê, beşeke bingehîn a siyaseta deverê ya rejîmê pêk dianî, û di wê zêdetir ji çar dehikan de, bi dehan milyar Dolarî samana Îranê li pêxema şerê bê dawî yê Rojhilata Navîn de heder daye; Lê niha ku Îraq bi şeweyek ji şewan dagîr kiriye û rejîma Sedam nemaye û rejîma “Wilayeta Feqîh” di Kerbelayê de deşteke bilind heye, rêya Quds ji wan berevajî bûye.

Ger serdemekê Spaha Pasdaran û rejîma “Wilayeta Feqîh” bi rêya Kerbela û Demişqê ve, dixwastin bigihîjne Qudsê, niha eva balafirên Îsraîlê ne, ku ber bi Sûriyê ve tên û bi ser Îraq de derbas dibin, û heta di wê dawiyê de jî digihîjne Tehranê, û bi wê rêyê ve herçî hêzê Spaha Pasdaran û bikirêgirtiyên rejîma “Wilayeta Feqîh” e, bombebaran dikin, û Cemaran jî bédeng e, û serşorr e, û ti tiştî nabêje!

Di wan çend salên derbasbûyî de, bi sedan car balafirên Îsraîlê di nav Sûriyê de hêzên Spaha Pasdaran û çekdarên ser bi rejîma Îranê bombebaran kirine, û bi dehan fermandeyên Spahê û bi sedan Pasdarên terorîst jî hatine kuştin, û hezaran ton mûşek û cebilxanê wan teqandine, û dengê ji Spaha Pasdaran û rêberê rejîma wan derneketiye.



Niha bi rêya Urşelîmê ve, balafirên Îsraîlê tên û dehan ton belge û arşîvên bernameya navkî ya rejîma Tehranê dibin û Xamineyî serê wî şorr bûye, û ti nabêje. Her heman balafirên Urşelîmê tene Tehranê û binkeya Parçîn bombebaran dikin, û diçin Netenzê, û deştetên çendîn sale ya rejîmê dikne dûkel; fermendên har ên Spaha Pasdaran û “Weliyê Feqîh” ên tirsinok ên Îranê bi awayekî serşorrî dibêjin me zaniye çi qewimî ye, û ti nabêjin!

Wan sedan kes ji ciwan û têkoşerên netewên Îranê bi tomata sîxurî û hevdengî digel sehyonîzmê tîrbaran kirin; Lê ku balafirên sehyonîstan! tene naverasta Îranê, Xamineyî û fermandeyên tirsinok ên Spaha Pasdaran tenê serşorrî bo wan dimîne, û tirseke kujek wan digre, ku neke ew balafirane Cemaranî jî bikin ax! Hemû dîktatorên cîhanê tirsinok in, û tenê bo bê deştilatan zîrek in, û bi kuştara wan hêrsa hundirê xwe de vala dikin!

Bo kuştina me, ne hewceyî yasayê ne



N: Serbest Urmiye

Eva temenê desthilata wan 40 sal derbas kirine û heya niha jî hêj nexuyaye ka kîjan destûr di welatê di bin desthilata wan de hakim e. destûra bingehîn ku weke hemû welateke din ê cîhanê divêt di Îrana di bin desthilata rejîma Îslamî de makezagona hemû yasan be, bervajî yek ji be nirixtrin destûran e. Kiriya û reftarên organên hikûmetê nemaze di Kurdiştanê de vê yekê bi êşkere nîşan didin.

Di heyamê temenê rejîmê de, her dem rewşa awarte li Kurdiştanê de hebûye û îdar-eya parêzgehên Kurdiştanê ji aliyê navendên leşkerî û ewlekariyê yên rejîmê ve hatiye kirin. Ji bo ku çî yasayeke medenî û sivil parêzgarîyê ji mafê şaromedniya xelkê Kurdiştanê neke, rejîm hewceyî berdewambûna rewşa awarte ye ku destê navendên wê ji serkutkirina gel re hertim vala be. Heke em bala xwe bidin destûra bingehîn a Îranê û valabûna destê serkutê yê navendên leşkerî û ewlekariyê yên rejîmê, bê gu-man ev rastî derdikeve.

Di vê mijarê de em hewil didin ku bal bikeşînin ser biçavkirina berfireh ku her di rojên yekem ên desthilatdariya rejîma Îslamî de li Kurdiştanê de heye û heya niha jî roj bi roj berfirehtir dibe. Nemaze di wan çend salên dawiyê de ku tevgerên sivil û bizavên mafxwaziyê di Kurdiştanê de derbasî qunaxeke nû ya tevalî bûne, bi xasmanî jî piştî destê pê bûna tevgera Rasan ku bi awayeke berfireh û tevalî xebata mafxwaziya gel di Kurdiştanê de derbasî qonaxeke nû û nûjen kir û

heya qasekê meriv dikare bêje ku bandor xistine ser heremên din ên Îranê jî û nav û dengeke cîhanî da xebata rizgarîxwaziyê di Rojhilatê Kurdiştanê de. Hevdem destê serkut û tepeseriyê yê rejîmê jî di Kurdiştanê de valatir bûye û rewşa awarte heya tê dirêjtir dibe û aliyên cur bi cur yê jiyana xelkê jî digire. Rejîm ji vê rewşê weke derfet mifahê werdigire û li ser navê paraştina ewlekariyê, di hewla serkutkirin û lawazkirina hemû bizavên civaka Kurdiştanê de ye. Heya heke bizaveke sivil û dûr ji siyas- etê jî be. Ji ber ku geşekirina bizavên sivil tê wateya berfirehbûna daxwaziyên demokratîk ên şaromendan ku ew jî dijberî îdeolojiya rejîmê ye. Lewma her rojê û bi hêcetê deriyê malên welatîyên Kurd tî şikandin û kê berdest bikeve tê lêdan yan tê binçavkirin. Bi qasekê ku girtîgehên rejîmê di cihê zanîngeh û navendên geşekirina civakî de, êdî yê bûnê pişka xelkê Kurdiştanê.

Pirsiyar Eva ye ka gelo girtin û binçavkirina xelkê li gorî kîjan esl û madeyên kîjan yasayê ye?

Destûra bingehîn ku makezagona hemû yasayan e, di eslên xwe yên 22, 26, 27, 32, 35, 38an de, qala azadiya takekesî û mafê welatîyan li hebûna azadiyê bi vî awayî dike:

Di esla 22an de dibêje ku nabe bîy îzna yasayê dest-direjî li ser aborî, mal, can û cihê jiyana welatîyan were kirin. Wate çî aliyekê mafê hindê nine ku çî dem û dem-jimêrê deriyê malên xelkê bişikîne yan ser dîwar de here û bîy hebûna destûra navendeke yasayî destdirêji-yê li ser azdadî û hebûna welatîyan bike û kesê bigire. Esla 26an rê dide ku rêx-istinên sivil, siyasî û ...hwd, werin damezirandin û nabe rê li beşdariya welatîyan were aştengkirin ku tede nebin endam. Wate rêxistin heya heke siyasî jî be, nabe endamên vê

bikevin bin zextê de.

Esla 27an, xwenîşandan û nîşandan nerazîbûne di rewşa sivil de azad e. Wate nabe çî kes seba beşdarbûne di rêpêvaneke sivil de were girtin yan heps kirin.

Esla 32an, nabe çî kes were girtin û binçavkirin, bê destûra navendên yasayî û heke kesek were girtin divêt di destpekê de hegera girtina wî/ê li gor yasayê jêre were şirovekirin û aliyê kê



heya 24 demjimêran derkeve hember dozger. Wate nabe girtîgehên rejîmê teji bin ji welatîyên ku renga bi mehan û salan e li benda dadgehê de bin, bê vî hindê ku bizanin li ser çî hatine girtin.

Esla 35an, her kesekê mafê hebûna parêzer heye ji bo ku li gor yasayê berevaniyê ji maf û azadiyên wî/ê bike.

Esla 38an, lêdan û êşkencekirin ji bo wergirtina îtrafê qedexeyê û hemû gotin û îtraf û heya sûndxwarin jî di bin zextê de, behitbar in. Eva di demekê de ye ku hem-ber û hevterîb digel destûra bingehîn, yasaya cezayên Îslamî heye ku tê de qala tawanên ewlekariyê dike li dijî ewlehiya rejîmê û destê serkutkirina welatîyan bo navendên serkutkar ên rejîmê vala dike û rê nade ku welatî-yên ku li ser navê dijberiya ewlehiya rejîmê tî binçavki-rin ji mafên xwe ên yasayî mifahê wergirin. Serbarê vî hindê ku destûra bingehîn û yasaya dadweriyê çarçoveya maf û azadiyê ji girtiyan re destnîşan kirine.

Berprsiyarên leşkerî û ewle-kariyê yên rejîmê ji berde-wamî û dirêjkirina heyamê rewşa awarte û yasaya ceza-yên Îslamî di Kurdiştanê de, weke mertalê serkutkirin û bê mafkirina welatîyan li ser navê dijberiya rejîmê û tev-lîhevkirina ewlehiya welat, mifahê werdigirn û carna jî dûr ji hemû yasayekê bi awayeke berfireh welatîyan digirin. Li navendên leşkerî û ewlekariyên rejîmê, ne-maze di Kurdiştanê de, girtî tî êşkencekirin û bê hebûna

parêzer tî dadgehîkirin.

Wate paraştina ewlekariya rejîmê ku di yasaya Cezayê Îslamî de û berevajî destûra bingehîn a rejîmê weke tawan tê naskirin, yê bîy alava serkutkirina welatîyan di hemû qadên siyasî, aborî, civakî, çandî û ...hwd de û rê ji hemû berpirs û endamên dezgehên sîxurî, ewlekariyê û leşkerî yên rejîmê re vala kiriye ku hertim destê wan yê serkutê li ser serê welatîyan be. Di demekê de ku hem esla 9an ya destûra bingehîn dibêje ku çî kesê mafê wê çendê çinine heta li ser navê paraştina yekîtiya welat jî be, azadiyê ji çî kesê verbi-gire û hem jî maddeya 4an a yasaya dadweriya Îranê ku sala 1392an a Rojî de hatiye pejirandin, rê nade ku hemû kar bi destên navendên ew-lekariyê, hezên çekdar ên rejîmê, endam yan berpir-siyarên dezgehê ewlekariya Spaha Pasdaran, Wezareta Îtîlaatê û rêxistinê Besic, welatîyan binçav bikin, ji bilî wan kesan ku li gor yasaya dadweriyê hatine elimandin û îzna binçavkirina tawanbaran ji wan re hatiye dan.

Hawara azadîxwaziya Rojhilatê Kurdistanê bi tepeseriyê nahête fetisandin!



N: Dara Natiq

Pêvajoya tepeserkirin û girtin û kuştin û qirkirina xelkê Rojhilata Kurdistanê ji aliyê rejîma dagîrker a Komara Îslamî û damûdezgehên wê yên emnîyetî û serbazî we, roj li pey rojê bi şidet û xortir dibe. Rejîma Îranê cuda ji siyaseta bîrsîkirin û bi talan birina heyî û samana binerd a Kurdistanê û guherîna demografiya vê herêmê, bi awayek berdeham û bi hincetên ewlehî, civatgeha Kurdistanê bi giştî û xortên Kurdistanê bi taybetî hevrişî girtin û zîdan û eşkence û darvekirinê dîkin. Rayedarên rejîmê her tim bi çavek emnîyetî mîzeyî Kurdistanê dîkin û xelkê vê herêmê jî weke şaromendê derece du dibîne û lewma navendên emnîyetî û serbazî yên rejîmê maşîna xwe a tepeserî û qirkirina civatgeha Rojhilatê Kurdistanê hertim û bi awayek şidet û berdeham dimeşînin. Rejîma Îslamî a Îranê di heyamê çar dehek ji deshîlatdariya xwe û bîy guhdan bi yasa û rêsayên navneteweyî û li pêş çavê raya giştî a cîhanê li tinekirina Kurdan berdeham e û roj li pey roj xortên Kurdistanê dibin goriyê siyaseta mirov kujane ya wê rejîmê.

Tenê di destpêka 3 mehên îsal de 67 welatîyên Kurd ji aliyê navendên tepeserkar yên rejîma dagîrkar a Îranê ve hatine binçavkirin. Li gorî raporta Ajansa Nûçegihanî ya “Kurdpa”yê du çalakvanên medenî, çar rojnamevan, parêzerek, sê çalakvanên torên civakî, çalakvanekî mafê jinan, deh çalakvanên Sine mezheb û du endamên mekteba quranê”. Sedem û awaya binçavkirina welatîyan: “66 kes ji welatîyan

ji aliyê hêzên ewlehî û yek kes jî, ji aliyê hêzên kinc şexsî ve hatine binçavkirin. Qedera 65 kes û cihê ragirtina 35 kesan piştî binçavkirinê nexuya ye. Hêzên ewlehî û Îtîlaatê êrîş kirine ser mala 25 kesan û vekolîne û wan hêzan dest danîne ser kelûpelên takî yên 3 welatîyan. Sê welatî di dema binçavkirinê de ji aliyê hêzên ewlehî ve hatine îşkencekirin û welatîyek jî hatiye birîndarkirin. Du kes ji welatîyên ku hatine binçavkirin jin bûne. Tenê tohmata 14 kesan di dema binçavkirinê de xuya ye. Çar kes bi tohmata alîkarîkirin digel yek ji Partiyên Kurdî, 3 kes bi tohmata hilgirtina alaya Kurdistanê, 5 kes bi tohmata çalakî di torên civakî de li dijî Komara Îslamî, 1 kes bi tohmata çalakîyên Olî û welatîyek jî bi tohmata alîkarî dan bi hepsiyên revî yên bajarê Seqizê.

Tepeseriya sistematîk a derheqê Kurdan her di destpêka bitalanbirina şoreşa azadîxwazî ya gelê Îranê ji aliyê rejîma dagîrker a Xumeynî û hevîr û hizrên wî re berdeham e û bûye beşek li jiyana xelkê belengaz yên Rojhilata Kurdistanê.



Neteweya Kurd li Îranê ji mafên herî destpêkî yên xwe bêpar in û heya îro jî çî pênasîn bi mafê keltûrî, civakî, aborî û ramyarî nehatiye kirin û hertim hevrişî asîmîlasyona çandî û guherîna demografiyê bûye. Her daxwazek biçûk û berheq ji bo mafê qanunî yên Kurdan bi binçav kirinê, îşkence, zîndanê û darvekirinê tê bersivdan.

Komara Îslamî a Îranê xwedî rûpelên reş e di warê desdirêjî û bînpêkirina mafê mirov û ev çende jî bi awayek xuya ji aliyê rêxistina Lêbûrîna Navnetewî û rêxirawên dinê yên mafê mirov ve hatiye diyarkirin û bi awayek dîkomênt hatiye weşandin û cîhan îro agadar e ji wê desdirêjî û bînpêkirinê. Lê welatên Rojava piraniya caran çavê xwe ji bînpêkirin û desdirêjiya ku li dijî netewa Kurd û rikeberên Îranî digirin û pişt serê xwe ve diavêjin. Ev bi piranî bala xwe di-dine bernamêyên Navkî (etomî) di halekê de ku çavê xwe ji bînpêkirina mafê mirov dimiqînin. Hindek welat ji ber berjiwendiyên aborî yan jî ji ber xirabîya rewşa mafê mirov ve wan bi baş dizanin ku bîdengiyê helbijêrin.

Ya ku li vir dixuye û ji raya giştî a cîhanê re jî eyan e ku dujmin û dagîrkerên Kurdistanê bi salan e ku siyaseta tunekirin û jinavbirina Kurdan bi pêş girtine û hemû hewlên xwe ji bo fetisandin û bîdengkirina gelê azadîxwaz û mafxwaz yên Kurd bikar anîne û berdeham jî pîlanên xwe yên qirêj û biyom derheq Kurdan dimeşînin. Lê di rastî de gelê Kurd her li ser pêyan e û xebat û berxudana Kurdan li dijî dagîrkarî û zîlim û zora neyar û dujmnên netewa me berdeham e û dengê azadîxwaziya gelê Kurd bilind û bilindtir dibe.

Hewceye ku raya giştî a cîhanî û nemaze sazî û navendên taybet bi mafên mirov û civatgeha navneteweyî bi giştî, bi awayek micid û bi gavên piraktîkî berengarî siyaseta tepeseriya rejîma Îranê derheq netewa Kurd bibin û maşîna serkuta rejîmê derheq gelên Îranê bi giştî û gelê Kurd bi taybetî bidin sekinandin. Nabe êdî çiyê din xwîna ciwanên Kurd bibe goriyê berjewendî û çavmiqandina civatgeha navneteweyî li ser siyasatên mirovkujane ya Komara Îslamî a Îranê. Dengê mafxwazî û dazadîxwaziyê bi darê zorê û êrîş û girtin û kuştinê nahête kipkirin. Berxudan û xebata gelê Kurd heya gihîştin bi elinda serkevtin û azadiya Kurdistanê yê her bidome û serkevtin yê bibe para Kurdan.

Hikûmeta xweşbijêv yan jî hikûmetek bo malxirabiyê?



N: Elî Munezemî

Enstîtûya «Legatum» li welatê Brîtaniya ku damezraweyeke bo lêkolînê li ser mijarên pêwendîdar bi xweşbijewiyê ve, her sal raporê li ser rêzbendîya welatan li gor xweşbijewiyê diweşîne. Armanca wê enstîtûyê nehêlana hejariyê li cihanê de ye. Ew saziya ku navenda wê li «London»ê ye, bilindbûna asta xweşbijewiyê li her welatekê de bi hebûna hikûmetek demokratîk ve girê dide û dibêje ku «eger dewletek demokratîk nebe, zor zehmete ku bikare dewletek xweşbijewî be.» Jiber ku nebûna rewatiya desthilatdariyê, dibe sedemê nebûna îstîqrarê; li ber hindê ku çavkanî bo nehêlana kêmasiyên binge-hîn wek perwerde, saxlemî, xwarin û vexwarinê bi diruştî nayên parwekirin. Di rapora wê saziyê de hatiye nivîsandin ku lêkolîn li ser 12 stûnan ku 65 elemênên dewlemendiyê hatiye kirin. Wan bo komkirina data û zaniyariyan li jêderên fermî mifah wergirtiye û di wê bawerê de ne ku ew karê wan dikare bo rêberên her yek li wan welatan alîkar be ku bizanin di çi meydanekê de lawaz yan bihêz kar kirine û di pêşerojê de dibe li kîjan meydana zêdetir bixebitin ku bikarin asta xweşbijewiyê li welatê xwe de hilkişînin aştêk jortir. Li gor wê raporê Îran di nava 167 dewletan de li pileya 119an de ye. Ew 12 stûnên ku wan bikar anîni wiha ne: Ewlehî, azadiya şexsî, dewletdarî, sermayeya civakî, hawirdora veberhênanê, rewşa beşdariya bo sermayeguzariyê, jêrxana welat, rewşa aborî, rewşa

jiyanê, tendûrûstî, perwerde û hawirdora xwezayî wate (jîngehparêzî).

Hikûmeta xweşbijewî bi wê wateyê ye ku hikûmet rolek sereke heye li parastin û domdariya standardên jiyana aborî û civakî a hevvelatiyan. Hikûmetek ku bo xweşbijewiya xelkê dixebite, dibe li hêlekê hevkarîya wan kesan bike ku nikarin li ser pê xwe bisekinin û di hêla din ve jî dibe hindêk xizmet û faydeyên giştî bo hemû xelkê werin pêşkeşkirin. Sîstemek han sê cureyên wê hene: Sosiyal-demokrasî, Konservatîv (demokrat-xirîştîyan) û lîbêlên anglo-saksonî). Di modela lîbêl de ku bingeha wê li ser bazarê hatiye danîn, berîk dizane ka kê re çi xizmetek were pêşkeşkirin û di modela konservatîv de jî erka xizmetguzariyan bo takekesan li stûyê malbatê de ye. Lê li sîstema sosiyaldemokrat de pirraniya erkê sîgorteyê di stûyê hikûmetê de ye. Jiber ku xelk zikatê dide dewletê û dewlet jî li xizîneya giştî, xercê xizmetguzariyên giştî û pêdivî bo xweşbijewiyê dide.

Di zagona binge-hîn ya rêjîma Komara Îslamî a Îranê de di paragrafa 3, 100 û 101 de bi êşkere basa xweşbijewiyê hatiye kirin. Her di wê zagonê de herwisa bas li çendîn cureyên maf û xizmetguzariyan hatiye kirin ku pêwendîya wan bi jiyana xweşbijewî bo xelkê ve heye. Bo mînak: di paragrafa 3 (xala 3 û 11), 30, 43 (xala 1), 100, 104, 141, 147 û 151 de basa perwerde û xwendinê, di pêşgotin, paragrafa 2, 3 (xala 7), 9, 28, 43 (xala 4), 67, 121, 154, 156 û 175 de bas li azadiyê (azadiyek ku qet li bin siya Komara Îslamî de nebûye û nîne), di paragrafa 3 (xala 12), 29, 43 (xala 1) û 100 de bas li tendûrûstî û dermanan, di pagrafa 28 û 43 (xala 2) de basa kar, di paragrafa 3 (xala 12), 22, 31, 43 (xala 1) basa xanî û mal, di paragrafa 43 (xala 1) de bas xwarin û berkirinê û di paragrafa 50ê

de jî bas li jîngehê hatiye kirin. Lê ya hemûyan balkêştir basa aboriyê ye ku di zaf paragrafan de hatiye. Lê her di destpêkê de avek tezî li ser destê xelkê dagiriye û nîyeta xwe ya sereke anîne ber bas ku «aborî alave, ne armanc e». Lê bo hemû aliyekê rohn û êşkere ye ku çi welatek nikare bêtê hebûna aboriyek xurt û bihêz, nikare bibe xwediyê sîstemek xweşbijewî bo xelkê û her wekî Komara Îslamî jî nekariye û nikare. Lê eger em bixwazin zelaltir bas li sedemên sernekevîna Komara Îslamî bo damezrandina sîstemek xweşbijewî bikin, em dikarin bi kurtî bas li wan xalane bikin:

- Jiber ku hemû şahdemar û kanalên aborî di Îrandê de li destê «Spaha Pasdaran» a terrorîstî de ne, îzna pişkdariyê bo afirandina derfeta kar û çareseriya pirsgirêkan di meydana herêmî û hemû welat de, nade bi «NGO»yan .
- Jiber kêmbûna asta baweriyê di navbera xelkê û karbideştên rejîmê û xelkê jî di zor aliyan de baweriya wan

•Nekarî li rakişandina tacir û sermayeguzaran bo bil-indkirina potansiyela aborî di welat de. Jiber ku hem bi hegera cezayên baykotê li ser Îranê semxatirê reftara nebaş û dijî ewlehiya navneteweyî û hem jî li ber ku Spaha Pasdaran dest li ser hemû aliyên aboriya Îranê de girtiye, çi kes yan kompaniyayek nikare wê rîskê bike ku di Îranê de sermayeguzarî bike.

•Perwerde û xwendin: Perwerde di Îranê de bi giştî û hêla xwendinên zaniştên civakî bi xasmanî giraniya zaniştîya xwe ji dest dane û di bin siya îdeolojiya rejîma Xumeynî de, çi nîrxek xwe nemane. Îmkanat û derfetên xwendinê jî bi awayek nedadperwerane tene parwegirin û zêdetir ew kes dikarin jê mifahê werbigirin ku girêdayî bi rêjîmê ve ne.

•Nebûna azadiyên takekesî, nebûna azadiya ragehandinê û berpirsiyar nebûna karbideştên hikûmetê di hember xelkê û ragihandinan de û girtin, eşkenecekirin û kuştina çalakvanên me-



bi hev re nemaye, bi sedemên siyasetên şaş yê rejîmê, sermayeya civakî di Îranê de gihîştîye nizimtirîn pleya xwe.

•Nebûna jêrxanek bihêz di welat de li ber siyasetên şaş yê rejîmê, belengaziya rêyan bi giştî û rêyên teranzîtî bi xasmanî, nebûna sîstemeke baş heta bo veguhaztina li rêya erdê, heva û avê ve, nebûna xetên pêwendigirtina telefonê, Înternetê û postê û dana wan bungahên girîng bi «Spaha Pasdaran» û têkdana ewlehiya xelkê bi wê hindê.

danên siyasî, rojnamevanî û parêzvanên jîngehê, çi fersendek bo ku meriv bikare nefesekê bi azadî bikêşîne, nehêlaye. Ew yeka werwiha bûye sedem ku li ber meşandina sansorek bêsinor, çi data û zaniyariyek ciyê bawerê ku di Îranê de tene weşandin, dest nekeve. Ew xalên ku bi kurtî li serve de hatin baskirin bûne sedemê hindê ku ne tenê hikûmetek xweşbijewî di Îranê de çênebe, lê hikûmet bi xwe

»»»» Doma R:5

bûye sedemê malxirabiyê bo xelkê û hevvelatiyan. Ew rewşa xirab li hemûyan zêdetir pêşiya xelkê kurd girtiye. Zarokên kurd li ber nebûna kar û îmkanatên sereke yên jiyanê, bûne kolber û wek koleyan jiyan

merivanetî li wan hatiye şandin. Ew eger hêza xwe bidin ber xwe û bikaribin wî barê xwe yê giran jî li ser çiyar re serbêxin, lê zaf tehlûkeyên din jî di ser rêya wan in û zaf caran canê wan jî jê tê şandin. Rejîma Komara Îslamî tixûbên navbera Rojhelatê digel Bakur û Başûrê welat

mînrejî kiriye û her roj komek li welatiyên kurd bi wê hegerê canê xwe yan parçeyek li laşê xwe ji deşt didin. Eger ew bikarin li meydanên mînan jî derbas bin, raştî teqeya hêzên rejîmên dagir ên Kurdiştanê û bi xasmanî pasdarên Îranê tî. Ew siyaseta rejîma terrorîstî û dagirker a Îranê pîlaneke bo qirkirin û jînosayda gelê kurd. Erkê hemû takeke kurd e ku wê siyaseta rejîmê bide danasîn û şermazar bike û di hember de bi hemû şeweyekê rabiveşte. Baştirîn raveştan di hember dagirkeran de, pêwendîgirtin û pişikdarî di «Rasana Rojhelat» de wek pêşmergeyê «çiya» yan «bajar» e.

Ka Rola “Întelecinsiya” Kurdî!?



N: Mihemd Hesko (hirasoz)

“Rewşenbîrî helwest e, ne pîşe ye!” Sartir

Bi dirêjahiya dîrokê û di temenê hebûna mirov li ser gerdûnê de, her û her ronakbîran û kesên xwenaskirî bi helwestên xwe yên wêrek hêvinê meyandina şoreşa ramanî bûn, wek feylesof Siqrat 399 b.z ku li hember ramanên çewt û yên efsûnî ji bîr û baweriyên xwe nehat xwar, û jiyan xwe kir qurbanî, û bi yekem pakrewanê felesefê û nasînê tê nasîn, her wiha rewşenbîr û xwenas bûne jêdera pirîskên agirê hilkirina şoreşên dijî zordariyê, û hilgîrên xetîrên azadiyê bûn, wek “Voltêr”, “Can Cak Roso” û “Lok” ku agirê yekem şoreşa lîberalîzîm di dîrokê de vêxiştin, ew jî şoreşa Ferensî bû ku sala 1789’an qewimî.

Erê jiyan, xebat û helwest e, piştî serxwebûna dewleta Sûriyayê sala 1946’an û tevî beşdarbûn û qurbanîdanên gelê kurd di piroseya berxwedana li hember dagirkerê Ferensî de, lê mixabin mîrxasî û niştimnaperweriya Kurdan raştî dîwarê şofîzîm û dîlkorîya erebî hat, ji bo paşguhxiştin û bêparkirina gelê Kurd ji hemû mafên xwe yên rewşa, û wek karvedaneke erênî pêşberî vê nepad-

peweriyê, kesên ronakbîr û rewşenbîrên Kurd xwe berdan meydan xebata sivîl û ya siyasî, çawa na? ma bideştveanîna mafan, ne erk û rola ronakbîr û rewşenbîran e, ew qata bijarde ne ku bi întelecinsiya tî binavakirin.

Li Rohilata Navîn bi giştî û li Sûriyayê bi taybetî, rewşenbîr kurd tûşî du serkutkirinan bibûn, ji aliyekî ve rejîma Be`is a şofîzîm bi serokatiya Beşa El-Esed yê dîktator û xwînrej, û ji aliyê din ve tevgera Kurdî hatibûn paşguhxiştin, ew rewş bû sedem ku Beşa El-Esed vê yekê bîne serê Sûriyê ku kuştarek neh sal in berdewam e, û tevgera Kurdî jî bi pîlan û zanîn û bi parçebûnên xwe yên diramatîkî xizmeta piroje û pîlanên neyaran kirin, û ketin hevrikiyeke dûr ji armanc û daxwazên gel.

Pirs ew e, gelo çima qata bijarde “Întelecinsiya” kurdî bi erk û rola xwe ranebû, û ta niha xwe ker kiriye, tevî çend yekîtiyên Nivîskaran, Hunermendan, Parêzeran, Navendên Lêkolînan û Sendîkayên Rojnamevanan hatine damezrandin, li şûna ku xizmeta ecindayên partîzaniyê bikin, divê bi erkên xwe yên pîroz rabin, û bi rola xwe li hember her rewşekê û bi taybet rewşa niha rabin, ma gelo qata bijarde “Întelecinsiya” ne leşker, artêş û parêzvanê maf û hebûna gel e, bi taybet piştî vê ku bi deştpekîrîna gotûbêjan di navbera PYD û ENKS`ê de bo yekrêzî ya mala kurdî li Rojavayê Kurdiştanê ku pêngaveke pîroz e, ma ev ne derfeteke zêrîn e daku em ji bindestiya rejîma Be`is a faşîst û şofîzîm û ji zordarî û ştemekraiya serokê

rejîmê Beşa El-Esed yê xwînrij û xwînmij rizgar bin.

Wek çawa pêşiyên me gotine: Bi xwezîyan, bi deşt nakeve gurzê keziyan! Erê dem dema xebatê ye li ser hemû aştan, jiber ku li ser me şerê man û nemanê ji aliyê dagirkerên Kurdiştanê ve hatiye sepandin, lewra ji hemû kesatiyên rewşenbîr û grûpên rewşenbîr tê xwestin ku, bibin alaveke fişarxistinê



li ser aliyên pêwendîdar, daku rêkkestineke di zûtirîn dem de ragihînin, û divê dengê xwe bilind bikin û biqîrîn daku herdu alî PYD û ENKS berjewendiyên neteweyî di ser berjewendiyên partîzaniyê re danên, daku Efrînê û Girê Spî û Sirê Kaniyê ji bindestiya bînamûsên Tirk û çeteyên bînamûs ên Erebbî rizgar bikin, eger na, nifirên dayîkên şehîdan, heta dunya hebe, wê ser we de bibarin.

Ey qata rewşenbîran (Întelecinsiya), rojêke reştarî û nexwezyar bi ser me de hatiye, û erêkî pîroz e neteweyî li ser milên me hemûyan e, ka werin em biqîrîn! Ka em xwedî li pîroziyên xwe derkevin, gel û welat dibin metirsiya man û nemanê de ne, ka ji bo pêşroja zarokên xwe tîbîkoşin, ta li vî dunyayê navê me hebe û dengê me jî were bihîştin, û em jî bibin xwedî al û dewlet di bin ezmanê şîn de. Almaya, 19.06.2020.



Nerîna Lîderan



“Donald Trumpo”:

“Me di heyama sala derbasbûyî de du terorîstên wekî Qasim Silêmanî û Ebûbekir Bexdadî ji holê rakin”.



“Mike Pompeo”:

“Welatên Rojhilata Navîn bi yek dengî daxwaza dirêjkirina tehrîmên cebilxaneyê Îranê dikan”.



Feysel Bin Ferhan:

“Rejîma Îranê bi mifahwergirtin ji girûpên tûndajo û bi afirandina şerên wêranker ên navxweyî, pirojeyê gefdar bo destbiserdagirtina deverê di nêrîna wê de heyê”.



“Gabi Ashkenazi”:

“Em nikarin wê yekê qebûl bikin ku rejîma Îran bibe xwediyê bombeya navîkî û emê çalakiyekî bikin ku ya baştir ev e wê carê neyê gotin”.

Huner û mûzîka Kurdî li Rojhilat û riftara dewletê



N: Eskender Ceiferî

Bajarên Kurdiştana Rojhilat ên wek Kirmaşan, Ormiye, Hewraman û navçeyên din, bi dîrok û çanda xwe ya kevnar ve naskirî ne. Mûzîka Kurdî ya Dîwanî li Ormiyê, Siyaçemane li Hewramanê û herwisa Horeya Yarsanan jî beşek ji dîroka Kurdiştanê ne ku li kêleka rîtmên Hewramî, ji kevnartirîn rîtmên mûzîka Kurdî ne.

Di çar salên derbasbûyî de dewleta Hesên Rûhanî bicîkirina Destûra UNESCO 2030'an li Îranê de sekinandin. Li gor wê biryarê, diviyabû dewlet ji bo pêşxistina çand û zimanên neteweyên ne Fars li Îranê tevbigerê. Navê wê destûrê weke pêşxistina berdewam a civakê jî hatibû naskirin. Bi sekinandina Destûra UNESCO 2030'an li wî welatî, bê guman neteweya Kurd jî bi çanda xwe raştî metirsiyê tê. Elî Xamineyî rêberê rejîma Komara Îslamî ragihand ku ew belge, çanda welatên rojava ye û em rê nadin bê bicîkirin ji ber ku li gor Xamineyî, ev destûr destnîşan dike ku divê heya sala 2030'an çanda Îslamî li Îranê nemîne û neteweyên cuda û jin û karker jî li wî welatî bibin xwedî maf.

Wek tê zanîn, ev rejîm li ser bingeha zext û givaşan û herwisa têrorîzmê hatiye avakirin. Lewma jî her tiştê ku dijatiya îdeolojiya wan bike, li wir rêpêdayî nîn e.

Bi vê biryara Xamineyî, gelek ji çalakvanên Kurd, dengê nerazîbûnê hildan.

Komeke mûzîkjenên Yarsanî li Kirmaşanê ragihandin ku êdî bi sekinandina vê destûrê,

Îran zêdetirî berê rê li ber asîmîlasyonê vedike. Jeman mûzîka ku di her du rejîmên Şah û Xumeynî de raştî zêdetirîn givaşan hatiye, êdî dîsa dikeve ber pêla bêrehmiyê. Wan mûzîkjenan, nameyek ji parlamenterên Kurd ên Kirmaşanê re şandin û têde tekez kirin ku heke ew destûr neyê bicîkirin, dibe ku mûzîka Kurdî ya herî kevnar li Kirmaşanê ku navê wê mûzîka Yarî ye, ber bi jinavçûnê ve here. Ew dibêjin qirkirin, ne tenê kuştin e. Lê belê dema ku bûdceya wezareta Çandê, ji mûzîka Kurdan re tê qedexekirin, wê demê êdî ew nûzîk ber bi jinavçûnê ve diçe.

Ew herwisa dibêjin heke çanda Kurdî jî li Kirmaşanê li gor reşnivîsa 17 xalî ya biryarnamê Neteweyên Yekbûyî li Kurdiştana Rojhilat di nava 9 salan de bêtî cudahî ji jin û zilaman re bê vegotin, êdî bandora modernîteyê jî li ser çanda kevnar namîne û ya Îslamê jî.

Lê piştî çend salan ne wezareta Çanda Îslamî beraiva wan daye



û ne jî parlamenterên Kurd. Bi vî rengî jî xuya dibe ku ew nûneratiya Kurdan nakin û ji no wan tenê posta wan li meclîsa rejîmê girîng e.

Riftara Îranê bi çandên cuda re ne li gorî biryarên Neteweyên Yekbûyî ye ku li gor wan, her kes bêtî ku raştî cudahiya ji ber nîjad, reng, zayend, ziman, ol, baweriya siyasî an jî yeke din jêbûna netewî an jî civakî, saman, zayîn an jî rewşeke din bibe, xwedî sûdwerirtina ji hemû maf û azadiyan e û divê dewlet li piştê wan bin.

Li Îranê ne siyaseta Kurdî li gor van biryarên NY cih girtiye û ne jî çanda Kurdî ji aliyê dewletê ve tê dîtin. Lewma jî hemû çalakî li Kurdiştanê bi berçavka ewlehî tên dîtin.

Rejîma Komara Îslamî qet naxwaze mûzîk û bi taybetî jî ya kevnar bê pêşxistin. Ji ber ku Elî Xamineyî di fetwayekê de dibêje guhdariya mûzîkan, derfeta gunchan çê dike. Li gora vê fetwayê jî, êdî wezareta Çanda Îslamî, ti pereyekî ji bo pêşxistina warê mûzîkê terxan nake û bicîkirina wê niha li Kirmaşanê ji parêzgehên din zûtir destpê kiriye.

Eger lê welatên pêşketî, girîngiyeke taybet a çand, huner û mûzîkê heyê, lê li Îranê, divê hemû tişt Îslamî û li gor biryara dîktator bin. Lewma jî qet xweşiya dilê xelkê, ji bo desthilatdariya Tehranê girîng nîn e.

Ev jî di demekê de ye ku salane bi mîlyardan pere li ştranên ji bo pitevaniya rejîmê tên mezaxtin. Lê belê ew ştranên ku xwediyên nasname û dîrokê ne, raştî pêla bêrehmiya dahirkar tên. Xelk jî bi vê mijarê hesiya ye û li gelek navçeyan, bi avakirina navendên serbixwe yên çand û mûzîkê, hewla paraştina nasnameyê didin.

Reaksyonên neyaran li dijî lihevkirina Kurdî-Kurdî



N: Ebdulazîz Qasim

Di 16ê meha Hezîrana borî de, gera yekê ji danûstandinên di navbera PYNK û ENKS de, di preskonfiresekê hevbeş de li bajarê Hesekê bi amadebûna nûnerê Amerîka û fermanîdarên hêza HSD bidawî hat û tê de xalên lihevkerinê li ser piransîpên peymanê Duhokê 2014 hat ragihandin.

Ev peyman nû bû cihê dilxweşiyeke mezin li nav gelê Kurd li herçar aliyên Kurdistanê û herwisa li nav revenda Kurd li diyasporayê, hevdem ku daxuyaniyên nerazîbûn û redkirinê ji aliyê hin aliyên leşkerî, siyasî û civakî yên Ereban ve bi îmzekirina 700 kesayetiyên nijadperestên Ereban hat ragihandin, bi taybetî ku daxuyaniyên dijminatîyê ji aliyê opozisyona Sûrî "îtîlaf"ê hatin, û bi awayekî kêmtir ji aliyê rejîma Şamê ve jî hin daxuyaniyên nerazîbûnê derketin.

Rejîma Tirkîyê ya dagîrker jî bi rêya wezîrê xwe yê derve dijminatîya xwe li dijî lihevkerina Kurdî-Kurdî xuya kir, û dijminatîya xwe li hember ENKS'ê ragihand û gef xwarin li her aliyê ku bi PYD'ê re danûstandinan bike, her ku êrîşên hevbeş yên Tirkîyê û Îranê li ser axa Herêma Kurdistanê ketin di çarçovê van gefên Tirkîyê de, ku ev êrîş hatin wekî bersivdaneke tund li dijî lihevkerina Kurdî-Kurdî, û bi taybetî li dijî hewldanên hikûmeta Herêma Kurdistanê û destpêşxeriya serok Masûd Barzanî di nava hewldanên Amerîkî û Fransayî de, yên ji bo nêzîkirin û lihevkerina aliyên siyasî û leşkerî li Kurdistanê Sûriyê.

Di heman çarçovê de ku li roja 1'ê vê mehê, mijara lihevkerina Kurdî di civîneke sêqolî ya vîdyoyî di navbera serokê Rûsyayê "Vladimir Putin", serokê Tirkîyê "Erdogan" û serokê Îranê "Hesen Rûhanî" de hat gotubêjkerin, ji aliyê wan lihevkerina Kurdî û her pêngavek bo peydakirina otonomî û statoyek Kurdî hat redkirin û di daxuyaniya civîna vîdyoyî de ev pêvajoyê bi "parçekirin û têkbirina serweriya Sûriyê" hat zanîn, hevdem ku ji aliyê her sê dewleran ve serweriya Sûriyê tê binpêkirin û xak û coxrafiyaya wê hatiye parçe û dagîrkerin û wêrankirin. Di aliyekê din yê daxuyaniya hevbeş ya wan de, behsa neftê hat kirin û tekez kirin ku divê dahata neftê nekeve di destê Kurdan de.

Ev karvedan û reaksiyonên dijminatîyê tîn bi wateya girîngiya lihevkerina Kurdî û tevî metirsiya van reaksiyonan, wê nikaribin kartêkirinê li rewşa lihevkerina Kurdî bikin, nemaze ku ev lihevkerin bi awayekî raasteraşt di bin çavdêrî û sponseriya Amerîka de ye, û ji aliyê balyozxana Amerîkî ve li Şamê ev yek bi pêngaveke dîrokî ya girîng hat pîrozkirin.

Îro, piştî derketina yasa "Sîzer" ku Îran û Rûsya wê raştî zîyanên mezin bibin, nemaze Îran ku rojane binkên wê yên serbazî li Sûriyê ji aliyê Îsraîlê ve tîne topbarankirin, lewra rola Îranê



di paşeroja Sûriyê de wê gelekî lawaz bibe, herwiha ku wê Tirkîyê tevî rewşa wê ya aborî ya sext wê raştî zîyanên mezin bibe ji ber destwerdana wê ya bihêz di karûbarên Sûriya, Libnan û Lîbya de, û piştevaniya wê ya raasteraşt ji bo çete û terorîstên opozisyona Sûriyê û şandina wan ji bo şerê li Lîbyayê û çakakîyên Tirkîyê di deriya Spî de ku ji aliyê gelek dewletên Ewropî ve nemaze yên NATO bi taybetî Fransa, Yonaniştanê ve cihê nerazîbûneke mezin e, û tevî Misr ku dewleteke zilhêz ya Ereban ye û dibe ku helawîştina endametiya Tirkîyê di nav NATO de careke din bikeve rojeva civînên wê de.

Helbet ku kêmkirina rola Tirkîyê û Îranê di paşeroja Sûriyê de, wê bibe derfet ji bo pêşketina doza Kurdî li Sûriyê û tişta herî girîng ku divê ENKS û PYD bi zûtirîn dem gera duyê ji danûstandinên xwe pêk bînin ber bi rêkeftineke berfireh û bicihkirina xalên lihevkerin û têgihiştinê li ser erdê.



Di bajararên Urmîyê û Baneyê de 3 Kolberên kurd hatine binçavkirin

Roja Duşemî, “2ê Pûşperê” (22ê Hezîran), Kolberêkî kurd ê bi navê “Erselan Natoş” di devera sersînora a “Cêrmê” a girêdayê devera “Tirgower”ê de, rastî gulereşandina hêzên leşkerî yên hikûmeta Îranê hatibû û piştî birîndarbûnê ji aliyê wan hêzan ve hatibû bançavkirin û bo girtîgeha navendî a bajarê Urmîyê, hatibû veguhaştin.

Ew Kolberê Kurd, xelkê gundê “Zengiln” a ser bi “Tirgower” e ku pêyê wî bi

sedema gullereşandina hêzên hikûmetê, bi dijwarî birîndar bibû û di dermanxaneyê girtîgeha Urmîyê de hatiye razandin.

Herwisa Kolberêkî din yê Kurd bi navê “Qabîl Mercanî Rad”, xelkê gundê “Elî” a ser bi devera “Mirgower”, di dema kolberiyê de li ser sînore bajarê Urmîyê, ku di encama teqîna mînê de, pêyeke xwe ji deşt dabû û her li wir hatibû binçavkirin û bo girtîgeha navendî ya bajarê



Urmîyê hatibû veguhaştin. Ji aliyeke dinê ve jî, roja

Duşemî, “2ê Pûşperê” (22ê Hezîran), kolberêkî ciwan ê bi navê “Seyîd Mîlad Muetter” ê xelkê bajarê “Seqîz”ê, di bilindahiyên ser sînora a “Hengejal”ê de, ji aliyê hêzên leşkerî yên hikûmeta Îranê ve hatibû binçavkirin û bo girtîgeha bajarê “Bane”yê hatibû veguhaştin.

Ew 3 kolberên Kurd bi “derbasbûna neyasayî ya sînora” hatine tawanbarkirin.

Sê çalakvanên jîngeparêz bi sedema agirberbûnê canê xwe ji deşt dan

Roja Yekşemî 28`ê Hezîranê, sê çalakvanên jîngeparêz yên bi navên “Muxtar Xendanî”, berdevk û endamê hey`eta damezrêner û endamê komîteya kirîs a encomena “Jîva” a bajarê Pawê, “Bîlal Emînî” û “Yasîn Kerîmî”, bona temirandina Agir li Çiyayê Merexêl û Bozînî a bajarê Paweyê canê xwe ji deşt dan.

Ew sê çalakvanên jîngeparêz di dema kontrol kirin û temirandina agir li Çiyayê Merexêl û Bozînî a bajarê Paweyê tûşî wê bûyerê bûn. Kontrol kirina agir di devera



Merexêlê bi sedema sextî û dijvariya rêkê û mînen bicê mayî yên şerê navbera Îran û Îraqê, gelek pîrskirik dirûst kiribûn.

Herwisa di rêkevta 3`ê Xermanana 97`ê, çar çalakvanên jîngeparê Kurd yên bi navên “Şerîf Bacver, Omîd Konepoşî, Rehmet Hekîmîniya û Mihemed Pejuhî”, di dema kontrolkirina agirberdana dariştanên devera Pêlê û Selesî a ser bi bajarê Merîwanê, canê xwe ji deşt dan.

Bidawîhatina heyama mirexesiya hepsiyeke siyasî ê Kurd

Roja Duşemî 29`ê Hezîranê, hepsiye siyasî ê Kurd yê bi navê “Mihemed Şerîf Salim Dizeyî”, heyama mirexesiya wî a pizîşkî dawî pê hat û bo benda hepsiye siyasî a girtîgeha bajrê Urmîyê hate veguhaştin.

Ew hepsiye siyasî piştî du rojan qerentînê, di benda emn a girtîgehê, bo benda hepsiye siyasî hate veguhaştin.

Ew hepsiye siyasî xelkê “Dize”ya Mirgevere ku di meha Bane a îsal tûşî vîrusa Koronayê bû û bo nexweşxaneyê bajarê Urmîyê hatibû veguhaştin.

Ji aliyê taya 2 a dadgeha binav şoreş a bajarê Urmîyê bi dadweriya “Elî Şeyxlû” 5 sal hepsa te`izîrî bi ser wî welatîyê Kurd, hatiye sepanandin.

Dadgeha şoreş a bajarê Urmîyê ew welatîyê Kurd bi tohmata “endametiya di yek ji Partiyên Kurd yên dijberî hikûmeta Îranê” û pêka madeya 499 a qanûna ceza ya îslamî, 5 sal hepsa te`izîrî bi ser de sepandiye.

Cezaya 5 sal hepsa te`izîrî a wî welatîyê di taya 1 a dadgeha pêdaçûn a bajarê Urmîyê bi 3 sal hepsa te`izîrî hate kêmkirin



û roja Yekşemî 8`ê Befranbara sala 1398`an di girtîgehê de bi wî hate ragihandin.

Ew welatîyê Kurd roja Yekşemî 1`ê meha Rezber a sala 1398`an ji aliyê hêzên ewlehî ve û piştî çar rojan lêkolîn di girtîgeha îdareya îtîla`at a bajarê Urmîyê bo girtîgeha navendî a wî bajarê hate ragihandin.

Hozan “Feqê Mîne” koça dawiyê kir

Hozanê kevneşop û stranbêj ê naskirî, “Mihemed Emîn Resûlî” naskirî bi “Feqê Mîne”, xelkê gundê “Axelan” a girêdayê bajaroka “Nelas” a bajarê Serdeştê, roja Dûşemî, 2ê Pûşperê di mala xwe de, koça dawiyê kir.

Hozan “Feqê Mîne”, li destpêka sala 1358an heya sala 1365an, pêşmerê PDKÎ di hêza “Giyareng” de bûye û piştê bi sedema nexweşiyê bi îzna PDKÎ ziviriye bajaroka “Nelas”ê.

Navbirî, heyranke binavûdeng ku ji aliyê mamosta “Hesen Şeweseli” ve hatiye lihevanînê, bi bîr û yada Sergurd “Kerîm Eliyar” sitrandiye.

Herwisa “Feqê Mîne”, Şimşaljenekî bi navûdeng bûye û çendîn berhemên hunerî wekî: “Tawanim debê çî bê leylim ho leylim ho” û “Kûrexene”, di jiyana xwe ya hunerî de tomar



kirine.

Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê, sersaxiyê dibêje malbat, xizim û kesên “Feqê Mîne” û xwe bi şîrikê xema wan dizane.

Îbrahîm Îbrahîm Kitêba “Kurd Ê Wargehên Wan” Belav Kir

Nivîskar û lêkolîvanê Kurd, Îbrahîm Îbrahîm berhema xwe ya nû bi navê “Kurd û wargehên wan di pirtûka Sûretul-Erd a Ibin Hewqel de ” belav kir.

Berhema nû ya Îbrahîm Îbrahîm li Stockholma paytexta Sêwdê, ji aliyê weşanxaneyê (Apec Tryck & Förlag AB)ê ve hate çap û belavkirin. Bergê kitêbê ji aliyê Xelîl Îbrahîm ve hatiye amadekirin.

Îbrahîm Îbrahîm ku guh dide mijara Kurdan di berhem û kitêbên zana û dîrokzanên Îslamê de, diyar dike ku Kurd Hewqel ji cîhanger û erdnîgarnasên din bêtir behsa Kurdan û wargehên wan kiriye û bi piranî û bi rengê balkêş jî.

Li ser sedema hîlbijartina Ibin Hewqel û vê berhema wî, Îbrahîm Îbrahîm di daxuyaniyeke taybet ji Rûdawê re ragihand: “Pirtûka Sûretul-Erd a Ibin Hewqel ji pitûkên herî giring ên erdnîgariya dewleta Îslamî dişopîne û wesf dike, jêdereke dewlemend e bi agahiyên li ser Kurdan û wargehên wan, rol û belavbûna wan di herêman de.”

Îbrahîm balê dikişîne ser gotineke Ibin Hewqel li ser Cezîrê û wiha dibêje: “Ibin Hewqel gotinek balkêş gotiye û diyar kiriye ku nabe em Cezîrê tevî welat û herêmên ereban bikin, bi hin bihaneyan hin êlên ereban ku ew



herêm ji xwe re kirine cih û mêrg.”

Navborî herwisa ji Rûdawê re dibêje ku: “Di pirtûka sûretul-Erdê de, Ibin Hewqel baş behsa êl û eşîrên Kurdan dike û pir deverên belavbûna wan destnîşan dike, dibêje ji Şehrezorê ta Amed û Azerbeycan û Mûsil û Cezîrê çiyayên bilind û bi berfirehî peyda dibin, tê de qebîleyên Himêdî û Larî û Mehranî û ji bilî wan jî ji qebîleyên Kurdî tê de dijîn, tevî Kurdên Şehrezor û Sehrewerdê jî.”

Îbrahîm Îbrahîm sala 1971ê li bajarê Heskê yê Rojavayê Kurdistanê ji dayik bû. Sala 1997an li zanîngeha Şamê di beşa dîrokê de lîsans wergirt. Di sala 2016an de jî lîsansa bilind (master) di beşa ziman û çanda kurdî de li zanîngeha Mêrdînê wergirt.

Di sala 2016an de bû xwendekarê dîktorayê di beşa ziman û çanda Kurdî de li Zanîngeha Dicleyê li Amedê. Di sala 2017an de Îbrahîm bû endamê Komeleya Nivîskarên Kurd li Swêdê. Di sala 2018an de jî Xelata Cegerxwîn a Akademî wergirt.

Îbrahîm berî vê berhemê berhemeke din belav kiribû bi navê: Rengvedana dîroka Kurdî di helbestên Cegerxwîn de, ku sala 2018an ji aliyê Weşanxaneyê APECê li Swêdê ve hatibû çap û belavkirin. RÛDAW

Binpêkariyên mafê mirov di Kurdistanê de

Di heyama sê mehên deşpêka îsal de 67 welatîyên Kurd hatine binçavkirin

Çartêra çalakiyan: “Çalakvanekî jîngeparêz, du çalakvanên medenî, çar rojnamevan, parêzerek, sê çalakvanên torên civakî, çalakvanekî mafê jinan, deh çalakvanên sinî mezheb û du endamên mekteba quranê”.

Sedeem û awaya binçavkirina welatiyan: “66 kes ji welatiyan ji aliyê hêzên ewlehî û yek kes jî, ji aliyê hêzên kinc şexsî ve hatine binçavkirin.

Qedera 65 kes û cihê ragirtina 35 kesan piştî binçavkirinê nexuya ye.

Hêzên ewlehî û Îtîlaatê êrîş kirine ser mala 25 kesan û vekolîne û wan hêzan deşt danîne ser kelûpelên takî yên 3 welatiyan.

Sê welatî di dema binçavkirinê de ji aliyê hêzên ewlehî ve hatine îşkencekirin û welatiyek jî hatiye birîndarkirin.

Du kes ji welatîyên ku hatine binçavkirin jin bûne.

Tenê tohmata 14 kesan di dema binçavkirinê de xuya ye.

4 kes bi tomata alîkarîkirin digel yek ji Partiyên Kurdî, 3 kes bi tomata hilgirtina alaya Kurdistanê, 5 kes bi tomata çalakî di torên civakî de li dijî Komara Îslamî, 1 kes bi tomata çalakiyên olî û welatiyek jî bi tomata alîkarî dan bi hepsiyan revî yên bajarê Seqizê.

Hewceye bê gotinê ku di wê heyamê de, binçavkirina bi kom û sîstematîk, bi taybet di bajarên Bane û Pîranşehrê de ku ji aliyê navendên ewlehî ve gewimîne (binçavkirina 13 kes li bajarê Pîranşehrê û 8 kes li bajarê Baneyê).

Du welatîyên Kurd ji aliyê hêzên ewlehî ve hatine binçavkirin

Êvareya roja Çarşemî 1`ê Tîrmehê, du welatîyên Kurd yên bi navên “Soran Nesîrî” xelkê bajarê “Gogtepe” a ser bi bajarê Mihabadê û “Omîd Ebasi” xelkê gundê “Îndirqaş” a ser bi bajarê Mihabadê, ji aliyê hêzên ewlehî ve hatine binçavkirin.

Ew du welatîyên Kurd, bi bê hebûna ti belgeyekî yasayî ji aliyê hêzên ewlehî ve hatine binçavkirin û bo cihêkî nexuya hatine veguhaştin.

Heya dema weşana wî nûçeyê, ji qedera wan du welatîyên Kurd ti zanyariyek ji ber deşt de nîne.

Her di wê derheqê de, êvareya roja Çarşemî 1`ê Tîrmehê, welatiyekî Kurd yê bi navê “Soran Muxtarîfer” xelkê gundê “hacîxoş” a ser bi bajarê Mihabadê, ji aliyê hêzên ewlehî ve hate binçavkirin.

Çarenivîsa sê hepsiyan Kurd di girtîgeha Urmîyê de Nerohn e

Sê welatîyên Kurd ên bi navên “Mesûd Hacîzade” ê temen 44 salî û xelkê bajaroka Sêro ya ser bi Urmîyê, “Keywan Reşozade” ê 26 salî û xelkê şehreka Îslam ava û “Umîd Seîdî” ê 25 salî û xelkê şehreka Îslam Ava a ser bi bajarê Urmîyê di girtîgeha Urmîyê de çarenivîsa wan nerohn e.

Deh meh e ku çarenivîsa wan sê welatiyan di girtîgeha navendî a bajarê Urmîyê de nerohn e û di wê heyamê de ji hebûna parêzer jî bêpar bûne.

Pêka çavkaniyek agehdar ji girtîgeha Urmîyê: “Mesûd Hacîzade, şiyana dabînkirina barimteya 600 milyon tumenî ji bo azadiya xwe ya demkî tine.

Mesûd Haxcîzade, Keywan Reşozade û Umîd Seîdî, 10 meh berî niha ji aliyê hêzên ewlehî ve hatine binçavkirin û piştî dawîhatina lêpêçînê bo girtîgeha navendî ya bajarê Urmîyê hatine veguhaştin.

Mesûd Hacîzade, di benda 4 a girtîgeha Urmîyê û Keywan Reşozade û Umîd Seîdî jî di benda Ciwanan a girtîgeha Urmîyê de hepsiya xwe derbas dîkin.

Agirî

- ◆ Rojnameya “Agirî” di van malperên jêrên de bixwînin:
- ◆ www.Kurdistanmedia.com
- ◆ www.Agirimedia.org
- ◆ rojnamaagiri@gmail.com
- ◆ www.facebook.com/Agirikirmanji


Navnîşana derveyî welat:

AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE

E - Mail: Agiri2003@gmail.com

Hejmar (377)

Wêne: Şehîd Hidayet Ebdulahpûr



**ŞEHÎD
HIDAYET
EBDULAPÛR**

**EZ DÊ NIRXA AZADIYÊ BI CANÊ XWE BIDIM
DA KU NAV Û DENGÊ MIN HERTIM
DÎ DILÊ AZADÎXWAZAN Û GELE MIN DE BIMÎNE**



**PARTIYA DEMOKRAT A KURDISTANA ÎRANÊ
DEZGEHÊ RAGIHANDINÊ**